

Silav! Di vê peyamê da mijara tayê/germahiya bedenê di zaorkan da tê hilêxistin. Ez derbarê vêya ku di dema tayê da dikarî çî karekî bikî pû kengî zarokekî hewcetî bi bijîşk heye, hin rênîşandanan raberî te dikim.

Demekê zarokekî ta heye ku germahiya bedena wî zêdetirî 38.5 dereceyên celsiyûs be. Derbarê zarokên bin temenê 3 mehî heta ji 38 dereceyên selsiyûs zêdetir. Di dema tayê da gumên/dêmen zarok sor û eniyê wî bi tîn dibe,. Her wiha ew pirrî caran tûşî zekemê an elameteke din a nexweşiyê dibe. Helbet pirrî caran ev ta xeternak nîne. Ta alikariya bedenê ji bo başbûnê dike.

Bi van 5 rênîşandanan tu dikarî alikariya zarokê xwe di dema ketina bi tayê da bikî:

1. Ava zzehf û çayê ji bo vexwarinê bide zarokê xwe. Ji bo zarokên nûwelidî şîrê dayîkê an jî podreya şîr bidiyê.
2. Bihêle bila zarokê te gellekî razê.
3. Tenê kincekî sivik li zarokê xwe ke. Lihêf an tişteki din navêje ser.
4. Ji bo zarokan hin dermanên taybet ji bo çareserkirina tayê hene. Ji dermanxaneyê bipirse bê ka çî derman ji bo zarokê te baş in.
5. Gelekî bala xwe bide ser zarokê xwe. Wek mînak tu dikarî ji bo zarokê xwe tişteki bixwîni.

Gelo tu dudil û bêbiryar î ku divê digel zarokê xwe serdana bijîşkekî bikî an na? Di van 8 rewşan da zarokekî hewcetî bi bijîşk heye:

1. Zarok ta heye û temenê wî kêmtir ji 3 mehan e.
2. Ta piştî 4 rojan baştir nebûye.
3. Daxistina tayê bi dermankirinê ne pêakn e.
4. Zarok gellekî westiyayî ye. Ew kêmtir bertek nîşan dide û hişyarkirina wî dijwar e.
5. Zarok şilekiyan venaxwe û paçikên xwe şil nekirine.
6. Zarok êdî nikare seriyê xwe ber bi pêş va bitewînbe an bertek nîşanî pelandin an hesassiyetê bide.
7. Zarok tûşî pirzikên ser çerm hevrê digel xalên sor bûye. Ev xalên sor nikarin bi guvîşandinê ji nav herin.
8. Zarok tûşî behicîna ji ber tayê bûye. Di vê demê da masûlke tûşî lerizînê dibin, zarok bêhiş dibe an reşika çavên wî ji rewşa xwezayî derketiye.

Gelo tu piştrast nîni ku divê çî bikî? Ji şewirîna dêbavan an jî ofisa bijîşkê zarokan bipirse. Hemî navnîşan û hejmarên telefonan li vir dibîni: www.meinkindistkrank.ch

Ez ji bo te û zarokên te hêviyên herî baş dikim!